Baran e…
Mihemed ELÎ
Efrin261@hotmail.com

Min bizav kir ez xwe bîskekê têxim dewsa hest û hizrên dengbêjên me yên nemir dema ku pêlên dildariyê di derya dilê wan de berz dibûn û ew gotinên nemir, ku pê agirê dilê xwe dikirin rûpeleke herheyî û li pirtûka çanda me ya herman werda(zêde) dikirin. Bi hêvî me ku bikaribim cihekî nefsbiçûk di şopa hostatiya wan de bigirim…

Baran e baran e baran e…
Keçê dînê ev heft roj heft şev in baran e
Dîlberê vaye xumxum û reqereqa ewran, şîqinî û çîka ji ber birûskan e
çivîk li ser malan qufilî û segên stûxwar li ber deriyan veleziyane
gelî newal mişt in, tazî bûne qirac, nuqumîn dar û giyayên deştan e
dibare gewrê hawar û bêtara qeralê me xwedane!
ga û sewal di axiran de diqîrin, hesp di tewlan de dişiyin, cotkar, xezalê di malan de li ber hevseran rûreş û şermok mane

Ev heft roj in heft şev in, keçê dînê
bi tenê melûl, bêkes û bêhal im
li benda te rindê westî dinaliyame

keçê dînê ji kerba dilê xwe re
ji bextreşiya dost û yarên dilan re
ez ê dakevim nav rê û kolanan
ez ê xwe bidim ber van sêvlek û van şirkane

baran e keçê dînê baran e
ber û zeytûnên me gihîştine
mîna memikên te zalimê di sîngê
şax û şivan de bihûrî û kemilyane
oyî oyî oyî… dîsa baran e

Ez ê dakevim hêteka çiyayê Metîna
hafa Xirêbe, Şera û Omera
ez ê ji te bikim bêdilê van gazin û lomane
oyî oyî oyî oyî oyî, oy eman xwediyo baran e

Ev soza heftan e, keçê tu didî dilê reben, ez nizanim a heştane

Dil û hinavên min li benda te heliyan
milên min lar bûn, kab û kuliyên min şikiyane
oyî oyî oyî..
keçê dînê, baran e baran e baran e…
Wele ez nizanim tu sax î tu mirî yî li ber van lêmişt û lehiyan e
Ez ê bikim derewan li dilê xwe yî rezîl, li hiş û li raman e
Ez ê bêjim gula min dilsoz e, gula min di eşqê de heman e
gula min li xwe kiribû kirasê melezî, fîstanê kurmancî
bi ser de berdabû, xefatnê qeytan ji hevrişmê kurmên me li yayle û zozan e
porxelekê, gula çavşîn, kezî û pêlikên xwe ristine
Wele bi ser sîngê sipî de
bi ser herdu cotê memikan de berdane
Xemil û xêza vê keçikê çima venakişîne ey xwedayo van reş û bêyom ewran e !!
Oyî hawara dilê min baran e baran e baran e baran e

Keçê baran e baran e baran e…
Gulîzera min giradayiye şaleke herîrî bi morikên kesk û sor û zer bi qenewîç û qenefane..
heqîqên sorika deşta Efrînê, doranê zirxê tiliyên zalimê
Keçê dînê xwe lê civandine û rapêçane
Wele dîlberê bejn û balava sicê, nava qamûşî bi ser van
qundere û solan de berdaye, û li hev dibane…
mîna nalên kihêla Dewrêşê Ebdî, bi ser pîçan xistiye
her ku gavekê davêje, dibire çem û çolane
Mîna çapqinê Tawîr begê lawîn mîrê kela Mêdrînê
perwazan dide xwe û meşa salekê di çend xulekan de qediyane…
Wey ez nemîn dîsa baran e, bi devê kun bi heft şirikan baran e
oyî oyî oyî….

Keçê dînê, li banî li pozê çiyayê Metîna, ciyê evdal û bengiyane
Ez ê destên xwe vekim li ber ezmanê dilan e
li ber mîrîtiya xweda û êzdan e
Ez ê bikim ji wî tikan û lavan e
bila biterike ev barana heftrojan e
bila dakevin ji sewdê ev rûbar û çeman e
bila *ker* bibe bayê girgîn, fîrefîra van daran e
Ez ê bikim ji nojdarê dilan, xwedanê derd û dermanê van zaman e
ez ê bikim ji xwedayê mezin, ji bavê ol mezheb û van dînan e
bila bi ser Efrîna me de kozika aşiq û sewdaliyan
gora mîr û axeyan, keleş, maqûl û van bengiyan e
çend xulek û katjimêrek were bi aramî û hêdane…
Keçê dînê, umir diziyê, tîrkeziyê, ez ê bêjim
bila hilwere tavek ji tavên tebaxê û van havînane
bila tîrêjên xwe berde pêsîrên Gulê, nav damar û rehên dilane
oyî oyî oyî… baran e
bila tîna wê biherikîne ji nav memikên zalimê
ez bimirim ez nemînim, xunava sibê, xwîdana gezane
Eger nebû wele ez ê devê xwe bidim, zareta şêx û van qewalane
ez ê devê xwe bidin, çiyayên EbdulEzîz û Sincarê

ez ê sînorên bêbext û dijminan bişkînim…
ez ê bikim tikan û lavan bi kurdiyeke xwerû, pak û resen
ez ê bixwînim xêzek dudu ji Mishefa reş ji van bendane
ez ê bejna xwe Gulê, bitewînim li ber Şêxadî û laleşa me kurdane
oyî oyî oyî oyî baran e baran e baran e…

Keçê dînê, baran e dîsa wele baran e
eger nebû û neterikî ev xezeba heftrojan e
eger nebû û ez nebihîstim xwedayê jor
mîna her car û wexta me Kurdan e
Gulê… ez son dixwim bi namûs û şerefa van dilan e
Ez ê rakim darê rimê bikujim derewîna van baweriyane
ez ê konê felekê daxim ji ser dîrakan û cihê wî ji Sibendê Silîvî re bikim xuyane
ez ê bînim debûr, mîrkut û qazmeyan
ez ê hilweşînim van malên bêxwediyane
oyî oyî oyî oyî oyî baran e dîsa baran e